

BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



ŞAIR, NIVİSKAR,
TEKOŞER, WELATPARÊZ,
SOSYALİSTÊ MEZIN
CIGERXWÎN
ÇÛ HEQÎYA XWE

NAVEROK

Cigerxwin, Mirovê Mirov	3
Danştin	6
Cigerxwin	7
Cigerxwinê Nemr	9
Edebiyat û Filozofiya Cigerxwin ..	10
Lî Qamişlo	12
Selaw Bo Yadi Cigerxwin	15
Ez Mirovim	18
Meriv Cî Bîbêje Hêjaye	19
Name û Telgraf	22



Berpirsiyar

S. FERMAN

Pergala Rûpelan

A. M. GILLY

Raxistina Nivisaran

RÛŞEN

Redaksiyon

KEYXUSRO SÍPAN

BENGÎN BOTANÎ

A. M. GILLY

RÛŞEN FARQÎN

B E R B A N G

Kurdisk tidskrift, utges av
Kurdiska Riksförbundet. Ansvarig
utgivare och Redaktör:
S. Ferman. Layout: A.M. Gilly.
Sättning: Rûşen.

A D R E S S

Kurdiska Riksförbundet,

RISSNELEDEN 55,NB

172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

TEL:08/984553

Prenumeratlon: Medlemmar

50.-kr/år Övriga 100.-kr/år.

Postgiro: 64 38 80-8

XWENDEVANÊN HÊJA!

Ev hejmara Berbangê pişti wefata Mamoste Cigerxwin der dîçe. Wefata ev mirovê mezin, ku bûye nişana tekoşina gelê kurd, birineke kûr di dilê me de hişt.

Ew, çî ji destên wi hatin bî jirîti, bî mêrxasi ani ci, stûxwarnekir, li dij zordestiyê serê xwe ne tewand, 60 salên xwe jî bo gelê xwe fida kir. Helbet gelê wi jî ev mirovê xwe yê mezin jî bir nake.

Ev hejmara Berbangê jî bo gramiya Mamoste Cigerxwin hejmareke taybeti ye.

BERBANG

B E R B A N G

Kovara Kurdi, Xwedi Federasyona Komelên Kurdistanê
Li Swêd.
Buha: 5 Kron.
Abona saleke: 50 Kron, 30 DM.

N A V N I Ş A N

Berbang, Rissneleden 55,NB
172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN
Tel: 08/984553
Postgiro: 64 38 80-8

MIROVÊ MIROV

Mamosteyê hêja Cigerxwin di 22 yê cotmeha 1984 an saet 3' yê sibê çû heqîya xwe. Ew mirin êşeki kûr di dilê me de hişt.

Dî diroka miletan de navên mezin henin, ku ew mîlet bî wan şexsiyetan serbîlîndin. Cigerxwin ji ji bo gelê kurd şexsiyeteke wusa ye. Kurd kê me ku navê Cigerxwin nebihistibe. Gelek kê mî nav di nav gelê kurd de hewkas belav bûye, bûye naveki efsanewî.

Mî Cigerxwin lî Swêd di sala 1979 an de naskir. Jî bo çapkirina diwana wî ya 4 a xebitim. Peywendiyên mî ên xurt di her babetî de ew çax destpêkir. Ez kê mî insan dîzanîm, ku meziyetên Cigerxwin bî xwe re civandibe; Bê rawestan, bî vî emrê xwe yê kal heşt saet binivise, bî dostên xwe ve bî hêjayî mijul bibe, û lî ser pîrsên Kurdistanê û cihanê bî xûrtayî raberzînan pêk bîne, di daxuyaniyan de lî herî pêş be, di civînan de, di nav xortan de be, bî wan hewkas kêfxweş û serfiraz be. Hêwîyeke mezin bî Cigerxwin re hebû. Ew ne dihat şikandin.

Ew hê karîbû gelek xîzmetên hêja jî bo gelê xwe bike. Lê çî

mîxabîm, ew di 84 salîya xwe de xort û jîr me berda û çû.

Lê ew xezîneke mezin jî gelê kurd re hiştiye. Ew tevgerên Kurdistanê kûr kûr kolaye. Ew dibêje: "Çîrok û serpêhatîya mî, perçek jî tevger û serpêhatiyên mîletê kurd e"

Tu kurdek bî kasi Cigerxwin ne-nivîsandîye. Bî tevî kitêbên wî yê nî çapkirî, lî dora 40 kitêbên wî çêdîbin. Ev jîmar ne tenê lî Kurdistanê, di warê nivîskariyê de jî ciki birûmet digre.

Seydayê Cigerxwin dibêje: 'Di va bû ku her kurdekî zana, welatparêz, xwenda hûr û kûr tarixa jîna xwe di gel wan serpêhatiyên ku bî xwe, bî jîndariya xwe re derbaskirîne, bî rast û dirîst binivîsanda, jî mîletê xwe re sermiyanêke mezin giranbiha di vî meydanê de bihişt. Lê çî mîxabîm ku heta iro hêj tiştêkî bî vî rengî ne hatiye xuya kirin'

Bê şîk ev gazîneke gelek di çî de ye. Kê mî tiştên nivîsandi gihaye gelê kurd. Lê Cigerxwin, Kurdistanê gav bî gav gerîya. Gele xwe baş nas kir. Kul û birînen gelê xwe jî nêzik ve di jîya û anî zîman.


S. Berman

Cigerxwin li gundê Mêrdinê, Hesarê tê dinê. Malbata wi, weke gelek malbatên kurd derd û xezeba talan, zordesti, hevkuştin û koçbûnê jiyane.

Mirov dikare bi kurtayi jiyana gelê kurd ya çata bîndest, bi rewşa malbata wi bine ziman, ku çawa zordesti li ser karker û gundiyên kurd bi çend ali pêk tê; "Destê me teng bû, reben belengaz û di bin bêş û belan de bûn. Me nîkaribû têr nan bi camêri bixwara. Em çend mal bûn dihatin Nusêbinê, beri palya ceha destpêke me giha diçênî û li bajêr difiroto û piştî palya ceha em diçûn gundên xwe ku palya xwe bîkin. Me li Nusêbinê dixebitin û me hin peran dîvand ji bo ku bîdî cendîrme û axa, ku xwe ji sor û setemê wan bîparêzîm. Lê ne hatina me, û ne xebata destên me têra bêş û belayên wan sordestan nedîkîr"

Zordesti û şerê navhev mecbûr dîke ku Cigerxwin û diya xwe herin Amûdê. Piştî mirina dê û bavê xwe, Cigerxwin dizivire Hesarê, 1927 an de dizewice û vedigere Amûdê, li ba xuşka xwe rêncberî dîke.

Cigerxwin ji sala 1936 vir de bê rawestan karên siyasi pêk tîne. Lê hişyarbûn û xebata wi hê kevntire. Şerê cihanê a yekem diçêde, Kurdîstan dibe 4 perçe. Fransî û Inglîz hê li Kurdîstan in. Ev rewşa xerab, bi hevkuştin hê xirabtir dibe. Lê ev dema xerab bi xwe re hişyarbûn ji tîne. Doza gelê kurd belav dibe. Cigerxwin di vi demê de, hê bê xeber û agah e; "ji nan û zîkê xwe û xwendina mizgeftê pê ve ti tiştêki di nedigeriyam, nîzani bûm kurd çawa, ji bo çî dixebitîn. Sala 1923 an 1924 ez li serdestê Şewqî Begê Erxeni li çî-



1937

wayê Qerecdaxê şiyar bûm. Piştî şerê Şêx Seid Efendi, sala 1925 min dest bi xebatê kir. Lê ew çax ez dostê beg û axayên mîletperwerbûm".

Cigerxwin di sala 1924'an de cara yekem şîir dîmivise. Şîirên wi tî nî jiberkîrîm û li Kurdîstanê belav dîbîn.

Di sala 1937 an de ji Cigerxwin Komeleke li Amûdê vedîke û xortan hinê xwendîna kurdî û welatparêzî dîke. Piştî şerê cihanê yê dîwem li Cîzîrê civata Azadî û Yekîtîya Kurd tî damezîrandîn. Dr Ahmed Nazîf Beg dibe serok û Cigerxwin dibe sekreterê wi. Navê xoybûn tî gu-

hertîn. Paşê ev komele dibe perçakê Partiya demokratê kurd li Îran û bi ya Iraqê re tî grêdan. Xebata Cigerxwin ya welatparêzî bi karên siyasi û bi nîvisandîna şîir û didome diçe. Çiqas diçe ew dîtinên xwe nîjen dîke, pêşve diçe, bir û baweriyên tekoşîna civakî bi hêz dibe. Ji bo Cigerxwin qunaxeke nû, destpêdîke rûpeleke nûh vedîbe.

Sal 1949:

"Cara yekeme ku polis û leşker hatîna mala min, cara yekeme ku hatîna girtîna, cara yekeme ku bûme hevalê komunistan, cara yekeme ku dubendî ketîye

navbera me û malmezînan''.

Dî vi qonaxê de Cigerxwin karên navnetewî pêk tîne, dibe şexsiyeteke navnetewî. Bî pêşniyari dî 1950 de dibeyek jî destîkê civata aştiwazên Suriya: "Û hê jî nû ve mîn xwe da xuya kîrîn û rêça xwe guhert û çûme ser oleki di û kevneperesti bî şûn ve hişt û gavên xurt û hêja jî bo welatparêzî, aştiwazî û gerdenazadî bî pêş de avêtîm, û piştamî gelek xurt bû. Nema paxavan jî dewlet û kevneperestan dîkîm, nema dîxwazîm jî maldar û derebegan re bixebîtim''

Cigerxwin li dora 10 caran tê girtin, û gelek tê êşandin. Lê bir û bawerîya wî çêls nabe, xurttir û tûjtir dibe .

Jî sala 1949 heta 1957 Cigerxwin bî Partiya Komunist a Sûriyê re dîxebite.

Dî sala 1957'an de Partiya demokratê kurd li Suriya tê damezrandin, Cigerxwin dibe endamê Komîta Nawendî. Paşê navê partiyê tê guhertin dibe Partiya Demokratên pêşverûyên Kurd li Suriya.

Dî 20'ê Nisana 1959'an de Cigerxwin derbasê Iraqê dibê, di zaningeha Bexdayê de, wekî morovê yekem dersê kurmançî dide.

Ta roja ku Cigerxwin çavên xwe li dinyayê girt ew, endamê Komîta Nawendî ya Partiya xwe û berpirsiyarê Ewrûpayê bû. Ew, 60 sal bî gelê xwe re şa bû û bî gelê xwe re êşîya. Kêmasî û xeletîyan vekirî digot, serhildanên kurd vekirî êşkerekî dikir, ku cardin gelê kurd nekeve nav şaşiyên kevî. Gazinên Cigerxwin jî serokên serhildanan ge-

lek e. Lê ew baş zanibû ku ew serokên nezanbûn axa bûn, beg bûn û gavên hêjatir jî wan hêvi nedibû. "Ca eger serdarê şoreşê mirovên birewer û zana bûn, ca eger armanc şorişa welatperwerî bûna, li hêwiya quran û sozê dijîmî destvala rane diwestîyan. Jî lewra dibê wan tiştan bîdî ber çavan;

1. Şorişa birewerî gereke beriya şorişa çeka bihata meydanê.

2. Serdarê şorişê gereke gelek zana, birewer û navdar bûna,

3. Beri şorişê gereke pêlên zordesti û sitemkari dî nav welêt de xurt belav bibûna, ku lingê dijîmî li ser barûd û xepsnê bûna,

4. Gereke mîlet bî carek daxwaza şorişê nasbîkîra û zanibûna jî bo çî şer dîke,

5. Gereke proxram hawîr bihata kîrîn û damarên mêraniyê li eniya herkesî belbibûna, ku karîbûna mal û canê xwe dî rîya welêt bî bawerî şer bîda.

6 Gereke bî hindîkî dewletek jî her çar smordarên şorişê dost û alîkarê şoreşgeran bûna, ku karîbîn jî xwe re çek û xwarînê peyda bîkîm,

7. Gereke qada şorişê li ciyê stratejîk bibûna, ku karîbûna xwe tê de bîparasta,

8. Divê şoriş di ciyê xwe da ranewestîya, jî bo ku dilê şoreşgeran xweş bibûna û mîlet xwe bî de rexê wan. Mîlet herdem hevalê xorta ye.

9. Gereke paşmêr, heval û dilxwazên şorişê li paş leşkerên dijîmî leşkergeha hîlweşanda,

10. Gereke jî nir û demên lihevhatîne şorişger kareke mezin bî-

kîm xwe têkûz bîkîm, madî, leşkerî. devjenî zora dijîmî bîbîn û her tiştî jî mîletê xwe, xelkên derve re bîdî zanî û xuya kîrîm''.

Cigerxwin bê rawestan dîparast, ku tekoşerên kurd nûjen, birewer û zana bî Kadîrên xurt jî bo Cigerxwin, hevîyeke mezin e bê wan xelasi tuneye.

"Dî nav tevgera Şêx Seid Efendî de yekê xwendevanê leşkerî nebû, hemî şêx, beg û axa bûn... Dî şerê Amed (Diyarbakîr) de çend top hatî girtî. Lê kes nebû berde. Jî lewra zazan, xayîşên qantîran qetandî û qantîr jî xwe re revandî û top li çolê hiştî''

Her usa Cigerxwin şerê netewî bî reneki nûjen, bî rêk û pêk û bî armanceke zelal, pêşverû, welatparêz daxwaz dikir û gazinên xwe li angorî wê dani zîman. Dî tevgera Şêx Seid Efendî de "çawa hun peyayên şorişê ketî nav bajêr dest bî talanê kurda kîrî û pertala dîkana revandî''. Jî bo wê yekê ew tim dîxwast bîne zîman, ku gelê kurd berî her tiştî zanibe ku jî bo çî şer dîke. Ew çax dijîmîni, hevkuştî, berdî -berdayî jî meydanê radîbe, bîngeha şorişekî gelêrî, nûjen tê avêtîn.

Yekîtiya gelê kurd jî bo wê yekê di her gazinên Cigerxwin de cih girtiye. Ew dîzanibû ku dengê gelê kurd tenê bî vi awayî nayê birin, serê gelê kurd tenê vi awayî nayê tewandî.

Ew digot:

"Şîvek tenê bê zehmetî bî qeweteke gelek kê mî carek ve tê şikandî. Lê deh şîva bîde ba hev! ca kî camêre wan bîşkîne''.

Ev nivîs, axaftîna dî taziyê Cigerxwin li Stockholmê ye.

DANIŞTIN

22 YÊ COTMEH SAET SISÊ YÊ SIBÊ CIGERXWINÊ
MEZIN,TEKOŞERÊ 60 SALAN , LI MALA XWE
YA LI TENSTA(STOCKHOLM-SWÊD),ÇAVÊN XWE
EBEDÎYEN LI DINYAYÊ GIRT.

Dı navbera 22-26 ê cotmehê li Tensta gângen.51,taziya Cigerxwin pêk hat.Bı sedan kurd,türk, hwd.Dı taziye de beşdar bûn.Her usa wezirê Bıyanıyan Anita Gradın ji li wê derê beşdar bû û axaftneke çêkir.

Gelek name û telgraf ji malbata wi re hatın.

Dı rojên taziye de axaftın li ser Cigerxwin û xebatên wi yê n cihê-cihê hatın çêkirin, şîrên wi hatın xwendin.

Dı 26'ê mijdarê de cenazê wi ji bo hurmeta dawiyê hat anina Tenstagângen 51. Bı sedan kurd türk,swêdi,ereb li wê derê cıviya bûn Bı navê federasyonê serok,ji partiya wi û kurê wi axaftinên kurt çêkirin.Dawiyê li dora cenazê Cigerxwin yeka yek bı hurmetek giran hat gerin û salon bı bêden-gi hat terk kirin.Paşê cenazê Cigerxwin ji wê derê hat hilanin.

Rojnamên rojin Dagens Nyheter û Svenska Dagbladet li ser wefata wi xeber belav kirin,Televizyon dı êvara 10'ê mijdarê niv saet li ser Cigerxwin proxramek weşand.

Dı 28'ê mehê de cenazê wi hate şandina Kurdistanana Sûriyê. Cenaze berê li Şamê ji balafirê hat derxistin û dı ser axa Kurdistanê derbasê Kamuşlû bû.

Jı berê de li dora Kamuşlûyê bı sedan kon hatûbûn danin.



JI ROJNAMA(ZARA ESPÎDE)
JIMARA 25 Ê SIBATÊ
1984 HATIYE GUHAZTÎN.

Nivîsyanê vê nivîsarê xwendevanê sala 5'a di Ûnîversîtêta Lenîngradê de perçê Rojnamevanîyê de EBDUL MECÎD SEXO

Û


Lêkolêperçê tarîxa çapkirinê di Ûnîversîtêta Lenîngradê de VALERÎ TOKAZOV in

Cegerxwîn yek ji rîstevanên bilind di tora kurdî (kurmanci) de tê jimartin ko di vî sedê bîsta de ye û rîstên wî doz û daxwazên cemahîrên gelê Kurdîstanî yê nî fireh dide zanîn û nîşandin.

Û di koka wê de dîmoqrati û umemî markîsîne. Çîroka kêferata dijî kevneprestên olperestên kurdên ko herdem kar û xebat ji dijminê kurd re dikirin, wan dijminên ko bi zor welatê kurd xistine bin destê xwe, ew kêferata wî çîkî bilind di nav nîvîşt û nivîsar û rîstên Cegerxwîn peyda dibî. Di rîstê wî de (Destê şêx maçî mekin),(Dijminê mîlet),(Ji bin destan tu derkev) û ji bil van jî, di awira Cegerxwîn de gelek bi xurtî û zanîyarî ew rîwên derew û xapînok, rîwên şêx û axan û derebegên kedxur ko gelê kurdê reben bi xapan dixun!

Tevgera Cegerxwîn di Kurdîstanê

CÎGERXWÎN



de û di xortaniya xwe de cenga cihanê ya pêşi û tevgera kurdî ya azadixwaz, ko di van bîst salande jî sedê em tê de, ko di hemî Kurdistanê de kirine.

Bi awakî xurt şopeke mezin di nav ristên wîde hiştine û hiştine ko Cegerxwîn vê tora payebilind biaferên!

Ristevanê kurdî Cegerxwîn gelekî bi tevgera (Şêx Seîd) ya sala 1925 ve maye, ko di kurdîstana bin destê turka de hatiye li darxistin. Lê ev dilşadî û rûgeşiya wî zû-zû hate guhertin û dilsarî û xem û kul û derd ketin şûna wê dilşadîyê! Jiber ko tevgera Şêx

Seîd hate pelixandin û bi sed hezaran kurd jin û mêr û zêç hatin kuştin û şewitandin, tenê ji ber ko dixwestin ji bin darê zor û sitemê xwe derxin û ser bixwe di welatê xwe de gerden azad ji xwêre dewletekê lidarxin.

Her wekû bi hezaran gund û xanî hatin wêrankirin û kumişandin. Cegerxwîn ristevanê kurdî di riwê vê zor û sitemê de bi gernasi rabû û bawer dikir ko ev bêbextî di navbera dijmin û kevneperestên olperest û derebeg û axa de biser gelê kurd de hatine barandin.

Û ristevanê me di nav gelê xwe de hêzekî mezin û xurt didît û sûnd dixwar ko ta dawiya jîna xwe wê ji bo azadiya welat û gelê xwe kêferatê bikî û di vî warî de navê xwe kir Cegerxwîn, yan ji ber vê zor û sitema ko li gelê Kurdistanê dibi cerg û dil û hinvên wî xwîne tavêjin.

Lê navê wiyê birastî Şêxmûs kurê Hesên, kurê Muhemed, kurê Elî ye, û Cegerxwîn da xuyakirin, ko çawa kurd di bin darê zorê de perîşan maye û çawa derebeg û dewlemendên kurd jî qerêja destê vî gelê perîşan dixun û malê wî didizin û direvînin.

Di rista xwe 'Pembiwê me ye, lê em tazîne' ristevan bi zimanê cotkarê kurdî da xuyakirin ko çawa xeyis-ye û çawa hêz bûye çawa ko dibêji:

Dixebitin şev û roj şerme hê jî birçî ne Welat li ser navê me lê em tê de bê cîne

Her wekî di rista wî: 'Qulingê per şikestî' de bi awakî remzî rewşa kurd wek rewşa Qulingê per şikestî dibênî ko hêlîna wî hatiye pelixandin û ristevan berê xwe didî Qulingê per şikestî û dibêjî:

Tu dilbirîn û ez Cegerxwîn, em çibkin, Nejadê kurd mezan û reben û xezan.

Ji alîkî divê hin serguhertinên tarîxî û siyasî piştî cenga cihanê ya diwem hatin meydanê û şopeke mezin di nav tora Cegerxwîn de girtin

Bê gomane, ko tora Cegerxwîn ya welatperwerî ji umumîya piroletarî hatiye dagirtin û gelek dewlemend bûye. Cegerxwîn bi dengê bilind dibêjî û gazî dikî: dixwazim gelê kurd û hemî gelên ko ji bo azadiya welatê xwe kar û kefarete dikin bibin yek!

Cegerxwîn bandikî birçî û belengazan û dibêjî: bibin yek perçe van qeyd û zencirên ser milê xwe bişkênin û ji bin darê kole-tî xwe gerden azad bikin! Cegerxwîn dostê yekîtiya Sovyetistanê ye birast û ronî ye û dibênî ko alîkarîya Sovyetistanê ji gelên bindest û sitembar re, Yekîtiya Sovyetistanê ji van gelên bindest re tişteki gelek giranbîha ye û bi rûmete. Cegerxwîn bi bir û bawerî dostaniya gelên Sovyetistanê payebilind û gernas û piştgirê gelên bindest û sitembar e.

Bê gomane, ko Cegerxwîn ne tenê alîkarîya tevgera kurdî-aza dixwaz dikî, di gotin û axaftinên xwe de jî ji mirovên xwedî

bir û bawerî tê jimartin û gelek dostê karker û cotkara ye.

Tora Cegerxwîn ya welatperwerî û karên wî ye cemahîrî û welatperwerî hiştine ko mirovêkî çawa bi jînê ve hatiye girêdan, wilo jî bi miletê xwe û hemû miletê pêşverû ve hatiye girêdan, û gelek birast û ronî alîkarîya gel û mirovên sitembar, bindest û zorêde dikî, ne tenê dinav ristên xwe de dibêjî.

Di nav civat û gundiyan devê kêferat û tevgerê dikî, û ji ber wilo Cegerxwîn navekî pir birûmet û navdare û dinav cotkaran Kurdistanê de deng daye.

Weha rengê hemî mirovên şorişger wî nas dikin, çawa ko herdem dostê hemî partî û mirovên komonîste jî, û gelek ji ristên wî bûne sitranên gel. Herwekû Cegerxwîn li nik pirên xwendevanên Sovyetistanê navdar e, Nemaze li nik bîrewer û çêkrox û pêzana. Ev navê Cegerxwîn bûye remza biserketina şairên Kurdistanê û gelekane şehadîyên xwe bi saya rist û tora Cegerxwîn sitandine û li ser kultura kurdî nivîsî ne!

Yek ji wan pêzan û hozanê mezin perefîsor K.K. Kurdoyêf ko di îro de serokê Ensîtota rojhatnasa Sovyetîstana Mezin li bajarê Lenîngrad e, ko bi Ekademîya Zanyariya Sovyetistanê ve girêdayî ye, pêzanê mezin Ordîxanê Celîl, ko ji bo zanyariya revanîyê re herdû jî hatine pêşkêş kirin, ko tora Cegerxwîn ji xwendevanên Sovyetistanê re bidin zanîn û lêkolan li ser nişti û nivîsarên Cegerxwîn, û divê salê de heştê salên jîndariya ristevanê kurd Cegerxwîn derbas dibin, ji bo wilo me biryar da ko em xwendevanên Rojname ZARYA (ESPÎDÊ) re giranbehiya nivîstên Cegerxwîn -Ristevanê gegelê kurd bidin nîşandan.

Cegerxwînê Nemir

Ey Xwedayê Rist û ey Pêxemberê kê şan û pak
Şehsiwarê xam û Tipan mamostê gel, bav û kak
Şahê Ture û Tûrevanan rêberê çeknas û çak

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin bor jî bî ey Seyda qet tu namirî

Raşiyê barê feqîran piştûvanê karkera
Hilgirê derd û kulên van palevan û cotkara
Zingelê jîna millet û dijminê van kedxwara

Hêvîya Rizgarî û hem pê şveçûna sê wîya
Wey omîda pêşketin û serxwebûna birçîya
Dawedarê doza zehmet kêş û jar û sêwîya

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin bor jî bî ey Seyda qet tu manirî

Ey çiyayê Hîmalaya mamostê şîir û edeb
Ne tenê kurd rêş girêdan li her derî û ji her celeb
Lê belê tev peşverûyên Faris û Tirk û Ereb

Bi xameya xwey rast û çalak wa Etaturk te şikand
Bi gotinên xwey şoreşî te ser li Şahîn Şah tewand
Bi helbestê xwey agirî per da riwê Seddam çirand

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin gor jî bî ey Seyda qet tu namirî

Çar yekê jîna te borî yan li ber cot yan şivan
Bê kes û birçî û sêwî ta ku bûyî ristevan
Lê li dinyê her şivanin Pêxember yan tûrevan

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin gor jî bî ey Seyda qet tu namirî

Şazde pirtûkên te îro tev ji hevî çê tirin
Bi naverok û ger bi hijmar ji ê Xwedê ne kêmtirin
Na ez şaşim... min bibûre pir ji ê wî xweştirin

Herkesê xwen Midîya û Salar û Cim û Gulperî
Yan ji destûra ziman ew bê hemdî xwe hilperî
Yan ji Ferheng û Reşo ew bê per û bask hilferî

Kî me ez? Ronak û Hêvî mal û sermyanê minin
Ji xwe Şifaq û Zend û Ewêsta steyrê izmanê minin
Sewra Azadî û Pîrîşk Încîl û Qur'anê minin

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin gor jî bî ey Seyda qet tu namirî

Ew dilê mazin di jinê çawa ê di naje nî?
Ew devê kû her li ken bû çawa ê di nakenî?
Qey bira em hew dibînin bejn û bal, çav û enî?

Milletê kurd rûpelan qetya û xama min şikest
Bihîstina tal gêjkirim û zû zimanê min vebest
Kû Cegerxwînê delal xatir ji jînê vaye xwest

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin gor jî bî ey Seyda qet tu namirî

Bîst û doye Çîrya pêşî roja dûşemba reşe
Sala nehse çar û heştê sala har û serxweşe
Kat jimêr sisê şifaqê çû ava roja geşe

Tû di gorê d serfiraz be bê kul û xem, bê keser
Rêc û şop û doz û daxwazên te danîn ser bi ser
Bi sed hezaran xort û qîzan hêj tû sax wê danê ser

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin gor jî bî ey Seyda qet tu namirî

Tevlî pêşînde dizanim pêşî wayê binav û deng
Kû bi saxî nabînim gerçî jû, gerçî dereng
Seyda kes bigrî cihê te serwerê jîr û çeleng

Lê ezê her çavenêr bim li çîya, deşt û kelat
Hêvîdarbim ji milletê kurd jê bi xwazim yek xelat
Kû Cegerxwîn di bîni bê derengî bowelat

Şerme bo me ey Cegerxwîn ser te kin şîn û girî
Her çiqas bin gor jî bî ey Seyda qet tu namirî

Xelîl

Edebiyat û Filozofiya Cigerxwin

Rohat

Dî jiyana mirovanda hebûn û tunebûn du bûyerên normaln. Lî ser rûyê dinê hemû mirov tîn û dîçin. Dî vê rêvaçûyîn û meşê da mirov hene lî pêşiya hemû kesan dimeşin, nawestîn, nahejin û bina wan firehe. Ew, dibin destan, stran û lî ser zar û zîmanê bî milyonan kesan dîgerin û bî gel va dibin goşt û hesti. Bî kurti ew tofên nemiriyê dîreşinin, ew mirinê dîrsinin. Dî civata kurdan da, wek gelek civatên dînan hejmara kesên nemir pîrîn. Bêşik yek jî van jî mamosteyê me Cigerxwine. ew diji û ew dî kûraya dilê gelê kurd da diji.

Bî rasti Cigerxwin, helbestvanekî kurd e. Lê belê nivîsandina helbestan miroveki nake helbestvan, ev bes nine û mirovan tîn nake. Bir-baweriyên helbestvanekî, tekoşina wî lî diji her tîrê zordestiyê, şahsiyeta wî karên wî, bî kurti serbilîndiya helbestvanekî helbestvanan dîkin helbestvanên gel û dîbin mal hebûna gel. Nivîskar û helbestvan hene vedîkîşin lî ser bicên belek jî bo navên xwe, xêra xwe dixe-

bîtin, jî xwe ra hêlinên piçûk çê dîkin û tîda dijin, heta roja

mirinê. Dî civatekê da hejmara van nivîskar, helbestvan û hunermendan pîrîn. Ew dî nav gel da nînin, pêşengiya gel nakin, holikên xwe da dînin, tîrsa wan heye û rûmeta wan gelek nîmze dî nav civatê da. Cigerxwin jî xwe ra ev rê nebîjart, wî ciyê xwe dî nav bilîndbûna tekoşina gel da girt, Jî bo azadiya gelê xwe. wî lî diji zordestiyê xwe avê te nav agirê şoreşê. Vê yekê rûmet û serbilîndiya Cigerxwin dî nav gel da gelek bîlînkîr.

Jî aliyê dînan bir-baweriyên Cigerxwin, xurtbûna wan ramanên wî, filozofiya Cigerxwin dabû pêşiya xwe, rastiya vê filo-

zofiyê û paqîjbûna hêvi û daxwazên Cigerxwin, tesîrek gelek mezînan dî nav gelê kurd da hişt.

Ew kesekî mirovhez bû, mirovan hez dîkir, wî nedixwast mirovayeti bikeve bî piyan. Ew kesekî internasyonalîst bû, baweriyên wî teng nînin bûn, wî gelek baş dîzanîbû wekî hemû xîzan, belengaz, karker, gundi birayê hevîn, hemû gel birayên hevîn çî reş çî spi Disa wî gelek baş dîzanîbû,

hemû zîmanên cihanê xweşin, stranên van gelan xweşin, delalîn, piçûktayî-mezînanî dî nav gelên cihanê da tuneye, jî ber van bir û baweriyên Cigerxwin lî diji xweperestiyê, nîjadperestiyê şovenîzm û faşîzmê hertîm dengê xwe bilîndîkîriye. Bêguman dewra Cigerxwin tîda jiyana xwe derbazîkîriye merc û hoyên wê dewrê lî ser Cigerxwin tesîreke mezînanîhiştîye. Destpêka şerê cihanê yê duwemîn hovîtiya ordiyên Hitler, kurştîna bî milyonan cihudan û serketîna gelên bîndest ramanên Cigerxwin gelek guherand.

Welatê Cigerxwin, welatekî bîndeste, êrişkari, hovîti, kuştînan û talan lî Kurdistanê tu wext kê mî nebûye. Çand, zîman û hebûna gel hertîm hatiye qedexekîrînan û gelê kurd bî bend-zîncîran va hatiye girêdan, bûye kole. Vê rewşa xîrabîkîrîbû Cigerxwin bî dengî bîhiştî, Cigerxwin mîkarîbû tenê lî bilîndbûna tekoşina gel mîze bîkîra, lî dîrîvê tekoşîne bîmine. Eş û jana gelê kurd dîkîşand, kezêb û cege- ra Cigerxwin jî dîşand. Bî kurti dî nav huner û helbestên Ciger-

xin da Kurdistan bû naverokeke fireh. Helbestên wi bûn stranên gel, wi tu wext janên gelê xwe li pişt guhê xwe va ne avit, bend û pêwendiyên gelek xurt di navbera gel û ramanên Cigerxwin da peyda bûn.

Ji aliyê din her çiqas Kurdistan welateki niv-feodal be jî, rûmeta feodalizmê di dewra Cigerxwin tê da rojên xwe derbaz kir, gelekî şkest, sist bû. Wek henermendekî Cigerxwin, hunera xwe xîste çek li dij bermaninên feodal sekmi. Vê yek jî piştî kevneperestiyê şkand, ramanên pêşketî li cihê van baweriyên puç û vala girt.

Bi kurtî Cigerxwin jî xwe ra sê dijminên mezîn hilbijart û li hemberî wan heta roja mirina xwe jî şer kir: Împeryalizm, kolonyalizm û feodalizm. Wi hunera xwe li ser bingehên diyalekti-

ki û materyalizmê pêkani. Dinênasiya wi, hertim wusay ma, nehate guhîrandin. Helbestên Cigerxwin bi realizmê va hatin hevirkirin û hatin avdan. Rastike din jî, Cigerxwin wek hunermendên burjuvaziyên piçûk û hunermendên bi serê xwe nebû, dijminê politikayê 'xofa' politikayê li ber derê Cigerxwin ra derbaz nebû. Wi baş dizanibû weki karên çand û hener tenê dîkarin li ser him û bingehên politikayê bimeşin, politika jiyîn bi xweye.

Bi rasti vekolandina naverok û serecama helbestên Cigerxwin bi serê xwe kareki mezîn. Birbaweri, raman, nexş û nigarên di helbestên Cigerxwin da cih girtine gelek rengin. Analiz û beşkirina van temayan, himên aborî politik, cîvaki û çandi di pêşveçûna hunera wi da çawa cih girtine

û çî rol listine tenê bi xebateke zanîstî va dîkarin û bêneronikirinê. Wê çaxê xwendevanên kurd û cihanê dîkarin Cigerxwin baş nas bikin. Ji ber misbeta kêmbûna xwendevanên kurd jî aliyê din da helbestên Cigerxwin zêde nehatine vergerandin, van herdu faktorên roleke gelekî negatîf listiyê di warê danasin û naskirina şaxsiyeta Cigerxwin da. Vê yekê Prof. Qana tî Kurdo baş şirovedike di gotareke xwe da: "Eger şer û helbestên Cigerxwin bihatana wergerandina ser rûsî, îngilîzî, frensî, almanî, dinyayê pê bihesiya û bi gota ev giliyan rastîn, neteweyê kurd dikare xwe bextewar hesab bike, ku şayireke wusan mezin pêşkeftî demokrat û internasyonalîst jî nav sing û berê Kurdistanê derketiye û neteweyê kurd dikare bi navê Cigerxwin ferix û kubar be".



Bi hunermendên tirk Melike Demirag û Sanar Yurdatapan re

MAMOSTE CIGERXWÎN

Li Qamişlo Di Hewşa Mala Xwe De Hat Veşartin

Hesekê û Qamişlo (80km) nivî nebibû. Li dû cinaze konvoyek ji 20km çê bûbû. Heta Qamişlo jî, rê tunebû ji insan û otobobila, Waliyê Hesekê ji qaymeqamê Qamişlo re têlêfon vedikir û digot: Lehiyek ji insan û otomobila ji Hesekê ber bi Qamişlo têye. Bira haya te jê hebe.

Gora xebra ku ji alî rêxistinên kurda natibû belavkirin, gerek cinaze sibehê seet 9'a bigêhîştê perê Qamişlo. Li wir nêzikî sed-hezarî civiyabûn li benda cinazê. Lê ji ber ku rê hatibû girtin, cinaze piştî nivro bi pêncî hezarî mirov gêhîştê perê bajêr.

Xwendekarên bistana, keç û xortên kurd di kincên netewî de, sûretên Cigerxwîn û beniyên gula di dest de navê rêxistin û koma

mikên Kurdistanî li ser beniyên gula kordonek ji hezaran çêkiribûn û pêşiya sed û pêncî hezarî dimeşîyan ber bi mala Cigerxwîn. Soqaqên Qamişlo têrî sed û pêncî hezarî nedikir.

Ne tenê bajarê bi bext, her ûsa jî Kurdistan rojêke dirokî dijî. Cara yekem bû ku gelê kurd mezinekî xwe bi vî awayî rûmetmendî vedişart. Bê şik ev yeka gelek tiştê nîşanî me dide.

Sed û pêncî hezarî laşê Cigerxwîn bi awakî întizamî li ser destên xwe anîn û gora wasiyeta wî di baxçê wî de veşartin.

Li ser gora Cigerxwîn Hemîd Derwêş, sereterê giştî a Partiya Demokratên kurdên pêşverû li Sûriya û Kerîm Ehmed, endamê polît buro ya Partiya Komunîst a Îraqê axaftin. Ta'zîya Cigerxwîn li Qamişlo heftakî dom kir. Wekî me bihîst li Moskova, li Paris, li Koln li şam, li Heleb, li Sdney, li Stockholm û li gelek cihên din jî kurda ta'zîya Cigerxwîn çêkirîye.

Xebra reş zûde gihabû welêt. Kesî bawer nedikir bi dengên ku ji telefonan derdiket, ji radyoyan belav dibû. "Cigerxwîn namire!" difikirî gelê kurd.

Belê, gelê kurd rast difikirî. Cigerxwîn namire. Ta ku gelê kurd li ser axê Kurdistanê jîndare, Cigerxwîn wê bijî. Gelê kurd ev yeka bi xurtî nîşan da.

Êvara 4'ê çiriya paşîn dora hezar kurdî dilsoz bi berpirsiyarên rêxistinên Kurdistanê vê li

mejdana balafirê a Şamê bêsebir dipan. Balafirê ku laşê Cigerxwîn ji paytextê Swêd, Stockholm'ê tanî, dakete xwarê Piştî demeke kurt tabûta ku laşê Cigerxwîn tê da bû. Li ser destên xortên kurda ji avaniya mejdana balafirê derket. Tabût bi carek ve bi gula hate xemilandin.

Nivê şevê rêwîtiya dirêj destpêkir ber bi Qamişlo. Bajare bi bext ku wê lawê Kurdistanê yê hêja di nav axa xwe yê sarde veşarta.

Xelkê Qamişlo bi vî yekê xwe serbilind didît. Çira hemû malan veketî bû. Xew nedikete çavê kesî. Ji bo ku serê sibê wê seydayê xwe li ser destên xwe bigerandana û wê bi hevra biqirîna: CIGERXWÎN NEMIRÎYE!

Ne tenê xelkê Qamişlo xew nediket çava. Ji çiyayê Kurmênc heta Dêrikê kurdên dilsoz ketibûn rê ber bi bajarê bi bext. Di bajar û gundên Kurdistanê de kar sekinibû. Li Qamişlo dibistan bala bûbûn. Derî hemû dikana hatibû dadan. Li nav bajêr te digo qey sêndîkakê xurt grêva giştî êlan kirîye. Gava tu derdiketî perê bajêr, te digo Cejna Newrozê ye.

Rêya Hesekê û Qamişlo ji trafika giştîre hatibû girtin. Ji xwe tu wasite di gundên Cezîrê de nemabû. Hemû cotkar û pale bi traktorên, bi kamyonan û bi pîkaban, di berbangê de hatibûn ser rê û benda Seydayê xwe bûn.

Gava ambûlansa ku laşê Cigerxwîn têde di Hesekê re derbas dibû, keç û xort, jin û mêr, kal û pîrên kurda bi hezaran di kincên netewî de li ser caddan li silava cinazê Cigerxwîn sekinibûn. Keçên kurda sê bi sê di kincên kesk û sor û zer de kuçe yên Hesekê xemilandibûn. Hê rêya



PIR DELALE SOSYALÎZM

T u dibêjî
tu nezanî
te nexwendîye
tu bizanî

Bi sitem û
bi maneyî
ji ber vê
tu dij fileyî.

Ez dibêjim
dem şoreşe
şoreş xweşe
gula geşe.

Gelo rabin
destpê bikin
welatê xwe
win çê bikin.

Bi Marksîzm
Lenînîzm
pir delale
sosyalîzm

Em dest bi
destê hev din
paşverûya
biçade berdin

Sosyalîzmê
xweş saz bikin!
komûnîzmê
re vebikin

Pir şêrîne
jîn wekhevî
ji xwarîne
kes narevî

Seydayê min!
Cigerxwîne.
derd girane
dîlbrîne.

Seyda Cîger,
welat bindest
ne ku pê nivis
vir de şikest.

27.7.1981

Ahmet Cantekin

LI QAMIŞLO EV RÊXISTÎN Î KOMELAN DÎ MERASÎMA
CENAZA CIGERXWÎN DE BEŞDAR BÛBUN

- Partîya Demokratê Kurdên Pêşverû li Sûriya,
- Partîya Demokratê Kurd li Sûriya,
- Partîya Hevgirtina Gel li Sûriya
- Partîya Demokrat a Kurdê Sûriya
- Partîya çep li Sûriya.
- Partîya gel a Demokrat ya Kurdistan-Iraq,
- Partîya Komunîst a Îraqê,

- Partîya Sosyalîst a Kurdistanê Îraq,
- Partîya Sosyalîst a Kurdistanê Tirkîyê,
- K.U.K.
- K.U.K. -Baskê Sosyalîst,
- Partîya Pêşeng a Karkerên Kurdistan,
- Partîya Karkerên Kurdistan.
- Partîya Karkerên Kurdistan - DDKD,
- Ala Rizgarî-herdû bask
- Partîya Komunîst a Sûriya

REXISTÎN Î MÎROVÊN KU BI BENIYÊN GULA TEVÎ
MERASÎMA CÎNAZÊ CIGERXWÎN BÛNE

- Partîya Gel a Demokratîk a Kurdistanê Iraq,
- Partîya Sosyalîst a Kurdistanê Tirkîyê,
- Partîya Pêşeng a Karkerên Kurdistan,
- Partîya Komunîsta Sûriya Perewên Mûrad Yûsif,
- K.U.K. Baskê Sosyalîst,
- K.U.K.
- Koma Gulistan a Folklorî,
- Koma Gel ji Heskê,
- Koma şefaqa a Folklorî,
- Koma Ronak a Folklorî ji Amûdê,
- Koma millet ji Dirbêsiyê,
- Koma Serxwebûn a Folklorî,
- Koma Narîn a Folklorî,
- Koma Aşîti a Folklorî ji Efrînê,
- Koma herê mî a Partîya Komunîst a Sûriya-Cezîrê,
- Xwendevanên Dîbistana Erebiştan
- Koma Armanca a Folklorî,
- Koma Xelat a Folklorî,
- Koma Newroz a Folklorî,
- Koma Aşîti,
- Koma Silehaddîn a Sportê,
- Koma Xanî a Folklorî,
- Koma Azadî a Sportê,ji Amûdê


- Koma Serxwebûn ji Amûdê,
- Koma Cûdî a Folklorî,ji Dêrikê
- Kesên welatparêz ji Amûdê,
- Kesên kurd xwendekarên Lîsê
- Doktorên Heskê,
- Xelkê Enterîyê,
- Keç û Lawên Xwendekar ji Qamişlo,
- Xwendekarên Kurd,
- Xelkê Gundê Tilşehîrê,
- Kurdên bajarê Heskê,
- Xelkê taxa Rojavayê Qamişlo,
- Xortên Serbixwe,
- Keçê Xwendevan li Oamişlo,
- Keçên Xwendevan ji Tirba Sipî,
- Kerîm Ehmed -Endamê Polît Buroya Partîya Komunîst a Îraq
- Hevalên Seydayê Cigerxwîn,
- Gelê Tirba Sipî,
- Remo Şêxo-Endamê Polît Buro ya Partîya Komunîst a Îraq,
- Hemîd Derwêş- Sekreterê Giştî ya Partîya Demokratê Kurdên Pêşverû li Sûriya,
- Ezîz Dawid - Ji Seroktîya Partîya Demokratê Kurdên Pêşverû li Sûriya û Berpirsiyarê Kovara Gulistan,
- Şêxmûs Êso û zaroyên xwe.

Selaw Bo Yadi Cegerxwînî Şair

Dr. Cemsîd Heyderî

Edebî kurdî zor şore siwarî be xwoe dîwê, ke espî xwayan tawdawe le meydani pêşxistinî û têkoşanî gele çewsawekeyan. Zor nûserî way lê helkewitwe ke xamekayan terxan kirdiwe le pênav mafî reway mirovî kurd le jianêkî serbest û azad û dur le çewsanewey netewayî û çîna-yetî da. Le sedey nozde we taku êsta çend şairî kurd meşîxeli rêgay rûnkerewavn girtute dest. Hañderî gel bûne bo têkoşan dijî dagîrker û dar û destekanyan le xofroş û çilkawxorekan. Bilaw kirdnewey bîrî kurdeyetî le nêwan genc û lawanda dest nîşan kerî dost û dijminî culanewey azadî xwazî kurd buyne.

Le edebî kurdî niwemenda şairî millî be naw bang helkewtune, ke edeb û şîrekanyan le ser demî xelkî kurde bilaw bugtewe û buyte goranî genc û law jin û piyaw, cotyar û kirêkar, çunke le gel wêst û xwastî rojaney jiyani komelayetî kurd guncawe û hestî xelkî çewsawey der bîrywe, derebeg û axe û hemu ewaney dardestî dijminî rêsiwa kirdiwe. Her wişeyek guleyeke arastey cergî dijmin kirawe, şîrakanyan çekî têkoşanî destî xelk bwe, her boyiş em şairane tûşî çermeserî û awarey û bend û zîndan û azar hatîne.



Şiar û edebî kurdî lem sedeye, dewrekî karîgerî bînîwe le huşyar kirdinewey newey niwêma ne şairaniman zorbey zoryan le rêzî têkoşanî gelekeyan Bûine û le xebat da beşdarîyan kirdiwe û deken.

La perey mêjûî edebî kurdîman zor dewlemende helbestî şorş-gêrane û bengewazî xelk. bo azadî. Belkû şîrekaniman wek mom sutawin le rêgay gelekeyan. Helbestekanî şairanî mirdû û zindû Hacı qadirî nemir, Pîremêrd, Faiyîq Bekes, Goran, Qanî, Zêwer, Hejar, Hêmin, Osman Sebrî, Qedirî Can Cigerxwîn Çêki xebatî têkoşanî imroşmanin.

Şairanî kurd nek تنها lerêgay wişewe beşdarî xebatî azadiyan kirdiwe. belkû, le xebatî çekdarîş û têkoşanî siyasî rojaney dirîxyan nekirdiwe, şîryan bo azadî û aşî û dostayetî gelan gutye.

Eger mirov be wêjdan temaşey laperey mêjûy kurd bikat, boy be çakî derdekewê ke şair û nûseranî kurd le korî xebat diwa nekewtîne, belkû herdem rolî pêşrewîyan bînîwe, her yekî be pê y bar û tiwaney xwoy.

Şairanî kurd le her perçeyekî Kurdistan jîya bin, yek amanc

û yek bîr koyanî kirdûtewe, ewiş bîrî azadî û û reswakirdinî koneperistî û axa û derebeg û xofroşan.

Bêkesî nemir debêjî!

Darî azadî be xwên aw nedirê

Qed ber nagirî

Ser bexwof bê fidakarî

Ebed ser nagirî.

Bo ewey mirow bitwanî şwênî Cigerxwînî şairî kurd le edebî kurdîman dest nîşan kat û payeî şairiyetî û niştîmanperwerî bigeynê te newey dahatûman, pêwîste, dan bewe binên, ke ewey bo êmey kurdî Iraq helkewitiwe û liwawe bo beşdarîkirdin le pênavî xizmetî edeb û ziman û kûltûrî kurdî behoy barî mêjûy Kurdistanî Iraq, bo birakanî kurdîman le parçekanî tirî Kurdistan helnekewitiwe, ca bayexdan bew çend Şair û nuseraney Kurdistanî bakûr, erkê kê girnge.

Ewey şayanî base, edebî zarawî kirmancî zimanî kurdî, mêjûy degerê tewe sedekanî nawendî,

ke edebî kurdî pênuşrawe û şirî mezinyan le peydabwe, ke cêgay serbilindî kurdin. Zor le geroke Ewrûpeykan Kurdistan gerawin deng û basî nuser û şairî kurdyan bo gêraynewe, le wane ke zor payeî berz û helkewtû bûyne wek Melay Cezîrî, Ehmedî Xanî, Feqî Teyran, Elî Herîrî û Melay Batê.. h. td.

Bêguman ew şairaney kurd be taybetî Xanî nemir, cêgayekî berzî heye le mêjûy edebî kurdî û kûltûrî netawayetîman. Belam le ber çend hoyekî mêjûy û barî siyasî Kurdistanî bakûr, edebî kurdî lem parçeyê da, dergaî pêşxistinî lêdaxirawe. Belam role dilsoz û huşyarekanî kurd her der fetêkyan bo liwabî, le kîşxwoyan hedawe, belkû cêgay şanazyê ke laperey yekemî me-

rojnamenûsî kurdî her le layen kurdî bakar derçiwe. Wek aşkraye le kotayî sedey nozdehem kurdistanî bakûr buîte meydanî têkoşanî siyasî û çekdarî le pê naw azadî kurde, û agirî têkoşan pery sendiwe û hemû miletanî jêrdestî Osmanî ala xebatyan berz kirdîtewe, a lem kateda le seretay sedey bîstem, le gundêkî biçûkî Kurdistan, nêzik be Mardîn-Hesar Şêxmûs Hesên nawêk hetiwete dinya; le temenî 30 salîda be Cîgerxwîn nawî dawitewe le Kurdistan.

Le seretay jiyani da, wek zor-bey ewaney diçne hucrey mela-kan, fêrî Quran û şerîet biwe. Ji-yani na lebarî kurd debênî, belam ewey zêtir karî kirdibê te ser şair û rêgay jiyani bo dest nişan kirdbê t û palî pêwe nabê t bo ewey hamû jiyani bo terxan bikat, wa diyarê şorşî Şêx Seidî Pîrane û damirkandîni le layen Turke Kemalyekanewe Eger-çî Kemalyekan tiwanyan bilêsey şorş bikujê ninewe, belan neyan tiwanî bîrî azadî le nawberin her çend çireyk dekujayewe, de çiratir runakî bilawdekirde we, her çen mirov dekuja dihalawî tir rêgay xebatyan heldebi-jard, blêsey şorşî Şêx Seid, Ci-

gerxwênî rapêça bo korî têkoşanî milî.

Cîgerxwîn şahîdî rasteqîney damirkandîni şorşe kebu, be çawî xwoy diwyetî çon leşkirî Turk rolekanî kurdyan le sêdaradawe, çon axe û bagzadekan dardestî dijmin bûine, eweş palî pêwe nawe, rîq û kîney xwoy le şîrakanî beramber ew dijminaney naw xwo der birî, wa diyare şair ewey çak zanîwe ta dar kirmî le xwo nebit temenî hezar sale, ca siir û karekanî Cîgerxwîn le rojewe babetêkî tewaw dij be çewsanewey milî û çînayetî degirê te xwo. Karasatî jiyani kurdewarî û barî alozî Kurdistanî bakur wa le Cîgerxwîn dekarat ru bikate Kurdistanî Surya û le Amûde cênîşîni bêt. Le çilekanda agirî şorş û têkoşanî kurd pere desênî, xebatî azadîxwazî kurd kewte pileyîkî pêşkewtutir, partî û hêzî, rekraxwî kurdî seryan helda. le Kurdistan Iran, Komarî Mihabadî dîmokratî damezira, be serokayetî pêşawey nemir Qazî Muhemed, le Kurdistanî Iraq xebatî çekdarî danemirka-ba, le Suryêş da, nuser û runakbîranî kurd çekî xebatyan helgirtibû, betaybetî govarî. "Hawar û Ronahî" ke le layen bine maley Bedirxanyekan derdeçû,

dewrekî baş dibîni le huşyar kirdîni xelk da. Her lew salaneş. Çend şairî nuserêkî kurd le Surya da çelemyan xiste kar bo rêswa kirdîni dijminanî kurd û le pê naw parasitîni û pê şixistîni kûltûr e edeb û zimanî kurdî da, bê-guman ewane dewrêkî girngyan bîniwa le diwarojî Cîgerxwîn. Le Surya da, çend dengêkî di-sozî kurdî raberayetî em xebatyan dikird, wek şair û nuser gewre mamoste Osman Sebrî, şairî beriz Qedrî Can, û bine maley Qedrî Cemîl Paşa... Her lew kateş Cîgerxwîn hate korî nusîn û bilaw kirdnewe le ser laperey. "Hawar" da dengî berz kirdewe dijî çewsanewe û bangî xelkî dekird bo raperîn

Diway kotayî şerî duhemî çihani û têkşikandîni Faşizm Cîgerxwîn le culanewey azadîxwazî nêzik debîtewe û dê te korî têkoşanî siyasî rojane, le seretay pencekan goranîkî niwê li jiyani Cîgerxwîn rûdida ewiş palî pêwe denê biçîte rêzî partî Komunîstî Surya û culanewey aştîxwazî. Bê gûman lem Qonaxeda Cîgerxwîn hestî netewayetî û çînayetî berztir: debî, dost û dijmini culanewey azadî kurdî be çaktir denasî. Em serdeme şeqlî tewawî xwoy le şîrekanî Cîgerxwîn da cêhêştiwe, belkû detwanî bilêyn, şîrekanî Cîgerxwîn, de dekiwte ser zaran û debîte goranî demî xelk sair nawî pêder dekarat û milyet peyda dekarat, be zor-bey degerênewe em serdeme. Babetî aştîxwazî û dostayetî gelan, bestnewey xebatî azadî kurdî be culanewey azadîxwazî gelanî jêrdest le penawî azadî û serbestî da. Cîgerxwîn degate ew qenaete, ke take rêga wergirtîni maffî kurd û geystîni be amanc, rêgay têkoşan û hewkarî hemû milatanî jêr deste. Ewey şayanî başbêt şairî nemir Goran'ş her lem maweyeda dête korî têkoşanî siyasî û bîrî û bawerî Sosyalizmî karêkî tewawî dekate ser şîrekanî û nawerokî



dewlemendtir dekat. Rêgay xe-
bat û têkoşanî siyasî Cigerxwîn
tuşî girtin û bend û awerey de-
kat, belam şair le xebatkirdî sil
nakatewe, rêga ber nadat, her
ber dewam debet le nusînî şîrî
şorşgiri û goranî delê bo aşti û
dostayeti gelan, û reswakirdinî
axe û beg û darûdestekyanan.
Bê taybetî dijî ewaney le jêr per-
dey amde deyan wist ser be xe-
likî kurd şor ken.

Şîrî Heval Ropson ez mirovim.
Cigerxwîn baştirî nimuneye bo
bir û bawerî internasyonalîzmî
Cigerxwîn, birayeti kurd û hemû
gelan.

Ey heval Ropson dengbêjê cihan
Paşmêrê selam, zana û însan
Ger nas û rê nas, dijiminî Dalas
w ser ava da, de ser çia ra
rengê teye reş, tê ber çavê me
dengê teye xweş, xoş tê gohê me.

Le kotayî em-şîrî da debêjî.

Bimrî koledar bimrî zordestî
Bijî Azadî bijî serbestî.

Goranî şair her le salî 1954,
emiş şîrêkî nusîwe bo pol
Ropsin

Pol Ropsin! ey Pol Ropsin!
Palewanî aşti! bilbilî witin!
Ta new dolî dûr û kilay Kurdistan,
Naw û dengit aşnan be giwê çkey însan.

Seyda Cigerxwîn, le berhemeka-
nî ew saleney diwayda le nawe-
rok da ciyewazî heye le şirakanî
nawerastî pencekan, îsta pitir
basî Kurdistan û kurd dekat, be-
lam piyaw debê bo mêjû bilêt.
nuser le nusnekanî herdem hê-
lêkî pêşkewtûxwazî girtye û be
pey tiwaney xizmetî kûltûrî
kurdî kirdiwe. Şirakanî çek des-
tî xebatgeranî Kurdistanî bakur
û Surye. Eweş way le hendê kes
kirdiwe Cigerxwîn be mezinti-
rîn şairî kurd bidte qelem. Belam
be ray ême, em helsangandne
dura, le mewzuat, çunke kurd
şairî gewre û lêhatîy hebîwe û



heye; betaybetî le Kurdistanî İ-
raq û İran. Be birway min Seyda
Cigerxwîn, yekê ke le şairanî
gewrey kurd lem serdeme, wek
le nawerokî şîrî û le têkoşinî si-
yasîda

Şîrî kurdi û şairanî kurd hiç
dem dirixyan nekirdiwe le beş
darî têkoşanî gelekayan, belkû
bo nimûne şîrî le Kurdistanî İraq
diway salî 1975 be dewrekî gew-
re helsawe le xebatî kurde, de-
tiwanîn be ser berzî binusîn ke
şairanî kurd nabezin û nebezîm,
dengî: rasteqîney xebatî. Bo ni-
mune le salî 1979 le Silêmanî, le
fistivalî şîrî kurdî da be aşkirina

deyan qrand le ruy dujmin û
çewşenarên, her wek le katî
xwoyda bêkesî nemir le ruy
Edmonds da qrandî, alay şîrî
sorîşgiri kurdî her berz demînete-
we. Çunke şairaniman denusin.

Ew şairey le naw azara ne sutê,
şair nîye,

ya delê!

Pê nusekem wekû haware tifenge
hewre tirş çeyî milyoneha deng
û renga Qed kip nabê,

heta dagir karêk mabê le cihana,
her emînê û bê deng nabê.

Seyday Cigerxwîn erkêkî zorî
xiste ser şanî nusaran û mêjûnu-
sanî kurd, ewiş nek tenha ber-
hemekanî bilaw bikrê tewe, bel-
kû lêkolînewey le ser bikrê t bo
ewey saye şairyê tî Cigerxwîn
dest nişan bikrê t le mejûy edebî
kurdî da. Beguman emeş be wi-
tarek û diwan nakrê, umêdewa-
rin role lêhatiwe kanî kurd le
diwa roja em erike be cê bê nin.

Witarekem be şîrî şairêkî law
tewaw dekem:

Min şairim!

şairim, şair ...
wişe dekem be kotir,
wişe dekem be şekir,
belam eger niştîmanekem bidizin,
debim be baranî agir
le awî gişt zordarêkda
wişe dekem be jehir...

Le ser daxwazî Berbang, em wi-
tarem nusî, her çende xom dûre-
perez girtibû le bilaw kirdne-
wey witar le govarekanî kurdi le
Swêd, belam erikî edebî û ko-
melayetî perjînekey pê şikan-
dim.

Welatparêziya Cigerxwin bî sosyalizmê ve hati-
ye pîşaftin, bûye ramanek navnetewî. Tekoşeri-
ya navnetewî ya Cigerxwin ne li ezmane ji gelê
kurd ne veqetandi û dûr e, bî gelê wi re bûye
yekcan û yekdem.

ez mirovim

Marksîzmê dixwazim
Li her derî dibazim,
Kûbîme serfirazim,
Berî her tiştî kurdim.

Sofiyatim bîrewer,
Emrîkîme divê m şer,
Asyewîme bi tevger,
Berî her tiştî kurdim.

Li Efrîqayê dikim şer,
Li Ewrûpa dikim ger,
Ez mirovim li her der,
Berî her tiştî kurdim.

Viyetnama gernasim,
Hindîme bê kirasim,
Ez birçîme pê xwasim
Berî her tiştî kurdim.

Gernasim mil ji pola
Nema dibim ez kola,
Diçim şerê Engola,
Berî her tiştî kurdim.

Dijminê koledarim,
Ne razame şiyarim,
Bi dijmin ez dikarim,
Berî her tiştî kurdim.

Ez dijminê kevnarim,
Jê hetîme dijwarim,
Ez mirovim, ne harim
Berî her tiştî kurdim.

Ez karkerim dest qerêj,
Dêwê reşim çîm dirêj,
Serê dijmin dikim gêj,
Berî her tiştî kurdim.

Ez cotarim diçim cot,
Bi dest min tim dar û rot,
Pî çirî û serî qot,
Berî her tiştî kurdim.

Heçî axa heçî şêx,
Bigre darê xwe, tim lêx,
Serê dijmin bipellêx,
Berî her tiştî kurdim.

Petrol diçî destê kê,
Çi hiltê nim didim kê,
Kara min çû di ber bê,
Berî her tiştî kurdim.

Hetta ku em nebin yek,
Dest navêjin dar û çek,
Emê bijîn wek parsek,
Berî her tiştî kurdim.



Meriv Ji Bo Cigerxwîn Çi Bibêje Héja ye

Zinarê Xamo

Di 22'ê çileyê paşm de gelê Kurd helbestvanê mezin Seydayê Cigerxwin wenda kir. Bi mirina Seydayê Cigerxwin, me ne bes helbestvanekî mezin, welatparêzê zeki hêja wenda kir, her wisa me, şervanekî aştiyê, neferekî çma proleter û piştevanekî hemû gelên bindest ji wenda kir. Ji ber ku Cigerxwin ne bes ji bona gelê kurd tenê bûbû Cigerxwin, ew her wisa Cigerxwinê hemû gelên bindest bû ji. Lewra ji meriv dikare bêje ew, ji kîsê hemû hêzên pêşverû, demokrat û aştiyê çû.

Belê Cigerxwînek hate Cihanê 81 salî jiya û dûre ji nav me bar kir û çû gerdûnek din. Lê belê ev 81 sal jiyanê Cigerxwin, vala û bê mane derbas ne bû. Ango wî, bes ji bona yîyanek xweş, zîkekî têr û rehatiya dinyayê salên xwe ne borand, rorê xwe sipî ne kir. Ew, jo gel xebitî û jiyanê xwe ki vê riyê de borand. Hetani roja çavên xwe dan hev ji, di nav vê xebat û têkoşînê de bû.

Cigerxwîn çû, ew iro ne dinav me de ye. Lê belê bi xebat, bi xizmet û eserên xwe ve wê her di nav gelê kurd de bijî. Ji ber ku wî, ji gelê kurd re xezînak gelek mezin hişt. Ev xizmeta Cigerxwîn, wê her û her bê te nîrandin.

Helbestên Cigerxwîn yê hetani nuha hatine çapkirin, di heft diwanan de hatine berev kirin. Bê van heft diwanên Cigerxwîn, gelek purtûkên wî din ji hatine weşandin. Wekî Reşoyê Darî, Gotinên pêşiya, Salar û Mîdya û xebatên li ser zimên û edebiyatê.

Li ser jîyan û xebatên Cigerxwîn rawestandî, bê guman ne karekî hêsaye, ji vê yekê re xebatek kûr û dûr dixwaze. Lê belê di vê nivîsara xwe de bi kurtayî be jî em dixwazin li ser çend nîqeyên ku di helbestên Cigerxwîn de berbiçavî rawestin.

MELE ŞEXMÛS ÇIMA BÛ CIGERXWÎN

Wek tê zanîn tu nivîskar û helbestvanên mezin, ji ber ku wan xwestîye ew ne bûne nivîskar, an jî helbestvan. Ê ew kirine helbestvanên mezin û kesên navnetewî, mercên welatê wan û cîhanê yê ku ew tê de jîyane. Bê guman ev yek ji bona Cigerxwîn jî wisa bû. Ew ji rewşa gelê kurd re bû tercuman û di helbestên xwena de bi hostayî ev halê xerab anî zimên. Di vê warî de gerên Cigerxwîn yê li her çar beşên Kurdistanê jî roleke mezin di helbestvanîya wî de lîst. Wî, di van gerên xwena de him feqîrî û belengaziya gelê xwe dît û him jî zulm û zora axan, began û şexan û hovîtiya hêzên mêtîngêhkarên dît. û ji nêz ve nas kir. Wî bi çavên serên xwe dît ku, gelê kurd di çî rewşek xirab de ye û hêzên mêtîngêhkar bi kevneperestên kurdan re çî zulmek bi hovîti li gelê wî dike. Li hember vê rewşê ew, bê deng ne ma, bi helbestên xwe ve têkoşîn da û ji bona xelasiya gel xebat kir.

Cigerxwîn di serî de hêvî ji axa û begên kurdan dikir ku ew jî werin bi gel re li dijî dujminên têkoşînê bidin. Lewra jî wî di gelek helbestên xwena de gazi li axa û began dikir, ku malên xwe di rîya rizgarbûna Kurdistanê de bidin û ew bi xwe jî di vê di nav şerê serxwebûna Kur-

distanê de çiyê xwe bigrin. Lê belê di jîyanê de Cigerxwîn dît, ku, axa û begên kurdan hevkarîya dujmin dikin û bi hev re gelê kurd bindest dihêlin. Ji ber vê yekê jî wî, piştî 1950 raste rast

berê xwe da axa, beg û şexên kurdan û bi xurtî êriş bir ser wan. Wî ev bîr û bawerî hetanî roja mirina xwe jî her parast.

DI HELBESTÊN CIGERXWÎN DE ÎNTERNASYONALÎZM

Cigerxwîn bi qasî ku helbestvanekî kurd bû, hewqasî jî Înternasyonalîst bû. Ev yek di helbestên wî de gelekî berbiçav e. Ji xwe ew, di hevpeyvînek xwe de wisa dibêje: "Ez helbestvanê kurdan nîne, li cîhanê helbestvanê hemû gelên bindest im". Cigerxwîn, dilê wî bi perîşanî û bindestiya gelê kurd tenê ne dişewitî, ji bona wan tenê ne dinivîsand. Her wisa dilê wî bi bindestiya hemû gelên cîhanê jî dişewitî û ji bona wan jî dinivîsand. Bi feqîrî û bindestiya wan ve diqêherî, lê bi têkoşîn û serkeftina wan re jî gelekî kêfxweş û dilşad dibû. Ango, bindestiya hemû gelan, wek bindestiya gelê xwe û serkeftina wan jî wek serkeftina gelê xwe qebûl dikir. Mesele di van helbestên jêrîn de ev yek, gelek eşkere ye.

"Ey heval Robson dengbêjê cihan Paşmêrê selam zana û insan Gernas û rênas, dijminê salar Di ser ava re, di ser çîya re Rengê te ê reş, tê ber çavê me Dengê te ê xweş, xweş tê guhê me Ev xebata te didî meş hêrzan Kê ferata te didî me lerzan Ev tevgera te ji bo insan Pir jê ditirsin axa û dehqan Xwedî sermîyan ji te ditirsin Hemî xanedan ji hev dipirsin

Dibêjin reşik çawa şiyar bûn?
Destê hev girtin li ber me rabûn."

Helbestek din, piştî serkeftina
gelê Vîetnam li dij Împeryalîs-
tên Fransiz. Ji bo vê serkeftina
gelê Vîetnam ew gelek kêfxweş
bûye û lewra jî ev helbest nivî-
sandîye.

" Diyan-Biyan fû, Diyan-Biyan fû
Lingê koledar ji ser te rabû.
Kurên te gernas xwe dane kuştin,
Navek pir bilind ji bo te hîştin
Tîpên azadî kuştin koledar
Noşîcan bi te xwîna wî vexwar
Dema ko serê koledar dişkî
Nizanim çima Dalas dipişkî
Çî lê teng dibî, gurê dev bi xwîn
Serê wî diêşî divê esprîn".

Cigerxwîn, dujminekî împerya-
lîzmê yê qanî qanî ye. Li dera ku
împeryalîstan zora hêzên bin-
dest birîye wî, şûrê xwe kişan-
dîye û bi mêranî êrîş birîye ser
wan. Lê li dera ku gelên bindest
bi ser ketine. (wek di helbesta
Diyan - Biyan -fû de) îcar rabûye
ji wan re lirandiye û serkeftina
wan bi dil û can pîroz kiriye. Me-
riv dikare bibêje ku Cigerxwîn,
her tim bala xwe û guhê xwe
daye cîhanê û di hemû şerî de
wî jî ciyê xwe girtîye. Ango din-
ya Cigerxwîn ne bes Kurdistan
tenê bûye. Mesele ew bi xurtî li
dij şerê Qorê jî derketîye û ga-
zî li xortên cîhanê û kurdan
kiriye ku neçin li dij gelên
Qorê şer nekin. Ew gazî dîke û
wisa dibêje:

"Ji bo kara xwe dikin vî şerî
Destê xwe dan hev zorkar û terf
Bere helweşin ev xan û dîwar
Da ku xurt bibî nufûza dolar

Li Walistîrîd govend û dîlan
Şahî kete nav dilê Tiroman

Ji Qorê rabin ji Hindê Çînî
Dinya ji bo we wisa namînî
Çekên xwe deynin rûnin wek bira
Xwîhê merjênin ji bona pera

Îdî ji bo we em nabin qurban

Mêster Eçîsan mêster Tiroman"

Evana çend mînak bûn, me jî
ber helbestên Seydayê Ciger-
xwîn girt. Bê guman meriv dika-
re van mînakan gelekî pîr bike.
Lê em bawer in ku, wê zêde
mînak dayîn ne hewcê be.

Di van mînakên jorin de bi kur-
tayî be ji me, bir û baweriyên
Cigerxwîn li ser dostayî û heval-
bendîya wî, ya bi gelên bindest
re dit. Bes divê bê te zanin Ci-
gerxwîn bes ji bo gelên Vietnam
Oorê û Emerîkî ne nivîsandîye,,
wî, her wisa ji bo gelê tirk, ereb
û faris ji nivîsandîye û biratiya
wan û kurdan jî parastîye. Ew, di
helbesta xwe ya Aleqemşê de
vê biratiyê wisa diparêze:

Miro du qat li herder
Yek li bin û yek li ser

Oata kurdên xwedî mal
Bi dijmin re bûn heval

Nema divên serxwebûn;
Tenê divê buxun rûn

Ku raserî millet bin
Berê dijmin dewlet bin

Ew ji diçin parleman
Tev birne misliman

Oata jêrî tirk û kurd
Tev birçine, tev zugurd

Divê em dest bidin hev
xebat bikin roj û şev

Bixin destê xwe ew dar
Herdû bibin xwedî par

Yanî bibin du dewlet
Dostê hev bin du millet

Yek bin li hember neyar
Rojên bir teng û dijwar

Di vê helbestê de jî tê diyin Ci-
gerxwîn, dostayî û biratiya gelê

Tirk û Kurd dixwaze û dîtinek
înternasyonalîst diparêze. Ji ber
ku ew baş dizane, yê gelê kurd
xistîyê bin darê bindestîyê ne
gelê tirk e, çma burjuva ye û ew
xwîna gelê Tirk jî dimijîn.

CIGERXWÎN DUJMUNÊ HÊZÊN KEDXWARE

Wek tê zanîn, di helbestên Ci-
gerxwîn de dujmunatîya axan,
began û şêxên kevneperest ciye-
kî gelek mezin digre. Ji ber ku
ew baş dizane û di helbesta jo-
rin de jî dibêje "qada kurdên
xwedî mal, Bi dijmin re bûn he-
val" Ji wê roja ku ew gihîştîye
vê bîr û baweriyê û virde wî, bê
nabên û bi xurtayî êrîş birîye
ser axa û begên kurdan. Di hel-
bestên xwena de gazî li feqîran
û gundîyan kiriye, ku li dij axa
û begên xwe derkevin, bindestî-
ya wan qebûl nekin û ji bona
wan nekevin gewrîya hev û hev-
dû ne kujin. Li aliyê din, îxanet
û hevkarîya wan ya bi dujmun
re jî, bi zimanekî edebî û gelek
hêsa raberî gel kiriye. Seyda di
helbesta xwe ya bi navê "ta
kengî" de li karker û cotkaran
diçêre û wisa dibêje:

" Ta kengî emê karker û cotkarê bega bin
Ev rengê biratî me nevê ger tim wa bin
Hevsarê me girêdayî bi kurtanê kera bin
Ew begler û axa û emê jêr û geda bin
Ew rêncberê dijmina emê rencberê wan bin
Ey karker û cotkar ^{es} dem hatiye rabin
Ta kengî emê karkerê axa û bega bin
Ta kengî emê hesîyê ber lingê sega bin."

Di helbestên xwe ya dindeji dibêje:

Dewlemendê bê şeref,

çi dikî ji van zêr û pera?

Sed hezar milyonê zêra

tê xe kurtanê kera

Van helbestên Cigerxwîn, di
destê kesên pêşverû û welatpa-
rêz de li hember axan û began
dibû çekê hêja. Li aliyê din jî,
van helbestanan ji ber dihatê ki-
rin, li malan û di odan de dihatê
xwendin û bi vî rengî ji şiyar-

bûna millet re xizmetek giranbiha dikir. Meriv dikare bêje ku, dema van helbestanan dihate xwendin, kela dilê guhdaran radibû û gir û buxda wan ya li hember beg û axan zêdetir dibû. Lewra jî axa û begên kevnepe-rest tu carî ji Cigerxwîn heznedikirin.

CIGERXWÎN NEYARÊ OLPERESTIYÊ BÛ

Di dîrokê de hatîye dîtin, ku ol (dîn), di rizgarbûna gelan de rolekî baş (pozitif) bilîze. Lê ji bona kurdan ev yek wisa ne bûye, bi vacayî ola îslamî rolekî gelek ne baş listîye û li ber rizgarbûna gelê kurd bûye wek bendekê û di destê dujmun de jî, hertim bûye wek mertalekê. Dema mere bi hawakî din bibêje "ol", bê kêma û bê zêdayî ji bona gelê kurd bû afyonek rastîn.

Ev afyon (ol-dîn) di serî de Cigerxwîn bi xwe jî kişand, tesîra wê ya ne baş jîyana xwe de dît û cardin dît ku, gel ji çawa di bin tesîra vê "afyonê" de dimîne û ji têkoşîna netewî dûr

dikeve. Ji ber ku Cigerxwîn di xortayîya xwe de feqê bû û bi feqetî li gelek herêmên Kurdistanê geriya bû. Di van gerên xwena de wî bi çavên serê xwe dît ku şêx û meleyên kevnepe-rest bi saya olî çawa gel dixapînin û pêrgiyê li şîyarbûna gel ya netewî û sinifî digrin. Û bi vê yekê jî van kesana dixwaze bi zanyarî û dixwaze bi nezanî be, ew, ji dujmun re xizmetê dikin û dibin sebebê ne xelas bûna gelê kurd. Lewra jî wî bi xurtî berê xwe da ol û olperestiyê. Ev helbestên ku Cigerxwîn li hember ol û olperestiyê nivîsandîyî di destê gel de him bûn şûr û him jî bûn mortal.

Cigerxwîn di helbesta xwe ya bi navê "Çibkim Bi Rojî û Nimêj" de wisa digot:

"Tazîme, birçîme, mela?
Çibkim bi rojî û nimêj?
Kom bûn li min derd û bela
Çibkim bi rîşa dirêj?"

Te ez kirim kolê neyar
Te ez ji banî birime xwar
Binstê dijmin mes û jar
Derman çîye ko wer, bibêj?"

Ji ber van dîtinên Cigerxwîn, wek hemû axan û began, şêx wî baş dizanî bû ku xebata rêxistinî, li ber xebata edebî ne, bende û wê paşde na xîne. Ji xwe ew bi xwe û eserên wî ji vê yekê re mînakek gelek berbiçav e.

CIGERXWÎN Û ZIMANÊ KURDÎ

Wek tê zanîn, ji bo nivîsandina helbestan li gel zanebûna hin tiştan, zane bûna ew zimanê ku helbest pê tê nivîsandin pêwîst e. Bi zanebûna zimên bê guman qesta me ne axaftina wî zimanî ye. Bi zane bûna zimên qesta me ewe ku: Divê ew kesê helbestvan haya wî ji helbestvan û hunermendên berî xwe, çilasîk çîrok, serpehatî, gotinên pêşyan, stran, dîlok û tiştanok wî gelî hebe û wan ji nêz ve nas bike. Dema em bi hawakî din bibêjin, divê haya wî ji edebiyata gelê wî hebe. Bê guman ji ya çîhanê jî. Dema ew, edebiyat û dîroka gelê xwe baş nizanibe, wê bê hêsanî nikaribe tiştên hêja û giranbiha jî binivîsîne. Lê Cigerxwîn helbestên gelek hêja û giranbiha nivîsand. Ji ber ku wî, ziman dîrok û edebiyata gelê xwe dizanî bû. Lewra jî meriv di gelek helbestên wî de dikare, dîrok û serpehatîya gel û dewlemendiya zimanê kurdî bibîne. Wî di helbestên xwe de bi comerdî dewlemendiya zimanê kurdî pêşkêşî me kirîye. Bi rastî jî dema mere helbestên wî dixwîne, bi çavên serê xwe dibîne ku ew çiqas hekimê ziman e û çiqas jî xweş û bi hostayî bi kar anîye. Lewra jî, her heyşt dîwanên wî jî xezînak gelek mezine. Bi taybetî jî ji bona ew kesên li ser ziman û edebiyatê dixebitin, an jî pê mujûl dibin.

Di dawiyê de dixwazim bêjim, Seydayê Cigerxwîn ji bona gelê xwe gelekî xebitî û xizmet kir. Meriv ji bo wî çî bibêje hêjaye.



name û telgrafên serxweşiyê

RÊXISTIN

Partiya Sosyalîs a Kurdîstana Tîrkiyê (Komîta Merkezi.)

Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdîstan (Polit Buro)

Partiya Geli Demokrati Kurdîstan -Iraq (Beşa Ewrûpa.)

Partiya Sosyalîs a Kurdîstan -Iraq (Beşa Swêd)

Partiya Hevgirtina Geli Kurdî lî Suriyê (Rêxistina Ewrûpa)

Partiya Komunistê Tîrkiyê -TKP

TUDEH (Rêxistina Swêd)

PSKT - Roja Welat

Partiya pêşverûyên Kurdên Sûriyê Rêxistina Yekitiya Sovyet)

KUK - SE (Berpîrsiyarê Ewrûpa)

Partiya Pêşverûyên Kurdên Sûriyê (Berpîrsiyariya Ewrûpa)

RIZGARI

Komîta Komela Kurdên Awîstralya (Şahin Bekir)

KAWA

KOMKAR

Komela Karkerên Kurdîstan lî Stutgard (Endamê Komkar)

Komela Karkerên Kurdîstan lî Bottrop

Komela Karkerên Kurdîstan lî Mannheim (Endamê Komkar)

Komela Karkerên Kurdîstan lî Heilbrunn (Endamê Komkar)

Komela Karkerên Kurdîstan lî Nurnberg (Endamê Komkar)

Komela Karkerên Kurdîstan lî Frankfurt (Endamê Komkar)

KOMKAR lî Fransa

Komela Karkerên Kurdîstan a Demokratîk lî Norveç

Komela Karkerên Kurdîstan lî Munih (Endamê Komkar)

Komela Karkerên Kurdîstan lî Bremen (Endamê Komkar)

KOMKAR lî Swêd

Komela Karkerên Kurdîstan lî Duisburg

Yekitiya Pêşverûyên Demokrêtên Suryan lî Swêd

Komela Karkerên Kurdîstan Berlina rojava (Endamê Komkar)

Federasyona Komelên Kurdîstan lî Swêd

Komela Jinên Kurdîstan

Komela Karkerên Kurdîstan lî Dortmund (Endamê Komkar)

Komela Karkerên Kurdîstan lî Koln (Endamê Komkar)

Komîta Karkerên Kurdîstan lî Heilbrunn (Endamê Komkar)

Komela Karkerên Awîstralya

Federasyona Komelên Karkerên Tîrkiyê -FIDEF

Yekitiya Xwendevan û Xortên Kurdîstan lî Swêd

Federasyona Komelên Karkerên Demokratên Kurdîstan lî Almanya Federal -KKDK

KKDK lî Kölner

Berbang

Enstituya Kurd lî Fransa

Koma Kurdnasên Leningrad

Roja Nû

Komela Nivîskarên Swêd

Serxwbûn

Komela Karkerên Tîrkiyê lî Danmark

ISTIB

Yekitiya Hunermendên Kurdîstan -Osnoyuck

Komela Karkerên Tîrkiyê (Serok Kasım Yeşilgül)

ŞEXS

Anita Gradin (Wezîra Bîyaniyan lî Swêd)

Fatoş Güney-Fransa

Şahin Sorekli -Awîstralya

Xwendevanên Kurdên Sûriya Macit Kamil

Qanatê Kurdo-Leningrad

Maria Hasan -Sovyet

Bali, nivîskar-Berlîna Rojava

Şanar Yurdatapan, Melike Demirağ, Zeynep (artistên tirk)

Gulistan û Hesên

Xwendevanên Kurdên Suriya lî Leningrad (Şehnaz, Fatê, Mecid, Hemid, Berzan, Dawûd, Şukri, Eli, Mîstefa û İsa.

Dr: Silo-Stockholm

Ferhat Berlin

Hawar-London

Rıza Çolpan-Awîstralya

Ehmed Zemci-Aldenhoven

Anne Danbeck -Stockholm

Gundi-Berlin

Rojen Farqîn-Stockholm

Zaika -Sovyet

Ulla, Pelle Ansjö-Stockholm

2 mesajên bê nav

Eli Gültekin û malbata wi

Şivan û Gulistan

Mahmut Baksi-Elin Clason

Fettah Şahin-Elmanya Federal

Christina Berthelsen-Norveç

CEGERXWÎN

Heta mabûyî del û cerget hemîşe her pir le xwên bû
Şerekanit bo xebatî gelî Kurdistan hewên bû
Wişey azadî û serbestî û aşti û yêrdî serdemit bû
Meşxelfî bîr û bawerî têkoşanekî xawên bû

Her çen kewa (Cegerxwên) bûyî dûr bûyî le xakî niştîman
Hemîşe del pir le jan bûyî le taw nak bûyî jîyan
Belam binû, asûde be, haka alayî rizgarîman
Şeka pewe le ser lûtkey çiyaw pê deştî Kurdistan

London 30.10.1984
HAWAR

ADRESS/NAVNIŞAN:

RISSNELEDEN 55,NB

172 44 SUNDBYBERG/SWEDEN

MASSKORSBAND



Ger te serbestî divê tin, yan azadîxwazî ji dil,
Xweş li ser Cûdî diîsim, agirê cengê me ez.

Çar şiv û kopal bi destim, temê deffê gurmegur
Ko millet bê û şiyar bit, Rustemê Zalê me ez.

Min ji bo kurd rê çirandî, rengê Ferhadê bi hêz,
Kelgemê şim, ser li ezman, pî li ser qadê me ez.